DENGÊ KURD

10-Gelarêzan-2713 k 1-11-2013 z DENGê KURD -hjmar (19) www. Pdksp.com

Buhur

Qonaxa îroroj ko kurd têde dibuhurin qonaxekezor dijwar û hestyare li seranserî kurdhstanê liser astê siyasî di çarçûve yê pêşveçûn û hevguncana kêşedoza kurd de li gel bazara siyasî de çi derbarê rehendê navherêmî de û çi li derbarê rehendê netewî de , lewra zor pêwîste ko kurd xwe li gor siyaseta biragmatî biguncînin da ko karibin di vê qonaxê re bibuhurin biberû qonaxeke baştir û geştir ve li asoyeke serbest û bervekirî û nexasma li rojava yê kurdistanê paşî yekbûna çar part û alîgirên hevalbend di tevgera rizgarîxwaz de ew yekbûna ko waneyeke dîrokî li dijî parçebûnê tomardike û wisa biberû yek xebat û yek helwêst li ser buhurê sazan û sazandinê

Dengê kurd

Qonaxa Têbuhurînê LêBûrînê diguncîne

2L

YPG

û Komerîşkên çekdar û şAnogerî

3L

Daxuyaniya Kongirê Yekîtiya Nivîskarên Kurd

3L

Pariyê Gendeliyê

YPG û Komerîşkên çekdar û Şanogeriyên Fantazî

Dengê Kurd

Li rojava yê kurdistanê şer û pevçûnên (ypg) ligel komerîşkên çekdar yên regezperestên ereb berdewamin wekû cengek xwînrêj û xwînî liser hemû astan çi ewlekarî û çi dagîrkirina xak û zalgehên pişkinînê û çi dabeşkirina buhur û bazgehên çûn û hatinê liser sînoran , lê ev şer û pevçûnên navneqebî û alûgorkirî çend rehend û têbînîyan tînin gorepana lêpirsîn û berpirsyariyê dako mirov dikaribe di mijar û pirsgirêkê de bigihêje , ya yekem: (pyd) û (ypg) dibêjin me rojava yê kurdistanê rizgarkirye ji rijêmê û em wî diparêzin ji destdirêjî û çavsoriya dijminan lê rewş û barûdoxê rojava dûrî ewan lêidwan û kelovajiyane jiber ko rijêm hîna bi hemû dam û dezgehên xwe liser kar û kargêranê ye , ya duwem : dema ko (pyd-ypg) xwe dibînin xwedî û parêzdar û pasvanê rojava divêtin ew hemû helûmercên ewan salixdanan bi cih bînin , lê ew kelovajî û quretî rûreşiyê diçespînin

lihimberî girtin û kuştina xortên kurd her çendakî û ev cihê welatparêziya vê rêxistinê tîne gorepan û dadgeha lêpirsînê . ya sêyem : dema ko (pyd - ypg) dibêjin me rojava rizgarkiriyê ji rijêmê ev derewkariyeke zor mezine jiber ko hîna wêneyên beşar esed lisazî û dam û dezgehên desthilatê dalqandîne û duruşmên partiya (baas) gelo? pisyar ewe ev rêxistin çawa û çilo evê derewçînî û virçonekiyê dirêse û didêre , ma gelo qey gelê kurd heta vê çendê nezan û gêlûgewce û dehbelore dako baweriyê pê bîne ? bi rastî ev rewşek tevliheve û saxtekariyeke seyr û mendehoşe .Paşî şirovekirina ewan her sê rehendan dê çawa (pyd - ypg) bersivên xwe bidin ji gelê kurd re li rojava yê kurdistanê , dêmekî hemû ew şirovekarî û helsûkewtên li gorepana leşkerî ko rûdidin û di qewimin li hev nakin û li hev naguncin jiber ko hevrikiyên (ypg) li gorepanê zor û belavin wekû (dahiş) û (nusra) û bi dehan bêlûk û komerîşkên çekdar û li hev didin li her deverê çi bi alîkarî û palpiştiya rijêmê û çi bi tena xwe lê dibin zeftûmesta hêzên ewlekariyên de. Çavdêr û dîdevanên siyasî xweş têdigihêjin ko (pyd - ypg) nikarin tu tevger û livlivînan bikin çi li astê çek û teqemeniyan û çi li astê xaknasînê bê piştevaniya rijêmê jiber ko her tişt û zanyarî ron û aşkerane ne pêwîstî şirofesaziyê û belgenameyanin ,lora şanogeriyên leşkerî serî dikşînin bi şêweyekî durûyane li ser hefit kindiran.

Vegere



Behcet Hemo

Ax birayê min,hevalê rêya min,ma ne zûbû ji koçberiya tere,tu çima bilez birê ketî bê nasname,bê pilan û pêlav. Ma te ji bîrkir ku xwîna Keyxisrewê Şevgêr,Selahedînê Kurdî û Berzanyê nemir di damarê te de diherike,lê tu bi kude here xwîn qet nabe av.Lê ez ji te dipirsim hevalê riya min ka rewşa te çi ye di bin konê xemgîniyê û penaberiyê de?. Çeme te xaka xwe bi hesanî berda?.Gelo ji bo ku tû di nav toz û axê de li hêviyên xwe bigerê..Çime te mala pîrê vala kir û dara çûkên gund zuha kir?.Gelo ji bo ku tu têkeve konekî tenik de bê sitar û bê buhar…Çime te rezên gund tîkirin û pirpirîkên rengên wekî xwe bê cî û bê war kirin?.Çime te Welatê bi xêr û bêr û şoreşa pîroz li şûn xwe hişt?.çime?!.Ne tu bûyî

ê ku te digot :

Em Kurd gewir û sipî ne ser bilind û Arî ne
Zend giran û gulî ne ` bi şêran re cêwî ne
Ne kin û ne dirêj in `` yek ji me bi sedî ne

Heger tu ditirsê ji minre bêje,heger tu ji kurdîtiya xwe şerm dike ji minre bêje,heger tu bi xebata xwe ,bi tevgera xwe ne ewleyî ji minre bêje…Ez dixwazim zanibim kengî bêhêvî,tirs û şînî rayên xwe berdan nav damarên te?.Kengî te biryar da ku tu destê min berdê û keda berxwedanê li ber ba bike?.Ma te ji bîr kir ku ez û te dest bi dest di serê xwepêşandanan de disekinîn beramberî alavên mirinê?.Ez ji te dipirsim hevalê riya min bi çavên tijî ava germ ma turaziye bi wê jiyana çavşikestîVegere,vegere şevbêrkên me hîn xweşin,hêviyên me hîn geşin,bi hatinê bi derçûnê,bi hevdîtinê bi pevçûnê…em hîn hene ne zik reşin... Welat digirî erê Welat digirî,min jêre gurzek gul anî razi nebû,min jêre çemek ji hêsiran berda razî nebû…Xwiyaye ku Welat min tenê na pejirîne ku milê te ne li milê min be,vegere…

www.arsivakurdi.org

Daxuyaniya Dawî ya Kongirê Bingihîn a Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê

Dengê Kurd

Roja înê 11- 10 – 2013an li bajarê Qamişlo li hola AL-Melekiyê kongirê bingihîn yê yekîtiyê karê xwe dest pê kir . Ev kongirê giştî û bingihîn di bin durişma (Nivîskar Wijdanê Gellan e) de bû . kongir balkêş bû ji ber jimarek mezin ji nivîskaran , ji gelek herêmên Kurdî tê de beşdar bûn . Wisa jî , gelek mêvan ji rêxistin, saziyên siyasî, civakî,olî û gelek kesayetiyên bi nav û deng amade bûn .Demjimêr 10 ê beyanî kongir dest bi kar û barê xwe kir. di destpêkê de kongir hûrdemekê li ser giyanê cangoriyên Kurd û Kurdistanê û yên şoreşa sûriyê rawestiya digel sirûda netewî (Ey Reqîb) .Gelek gotinên balkêş hatin xwendin , hemiyan kongir pîrozkir û serkeftin jê re xwestin . Konkir karê xwe berdewamkir û gengeşe li ser piroja reşnivîsa bingihîn bi awakî hêja û berpirsiyar hat sergihayîkirin .Kongir biriyar da ku komîtek pispor ji bo sazkirin û serastikirina reşnivîsê bê avakirin ,helbet li gor têbîniyên endaman .Konkir jimarek ji pêşniyar û biryarên giring sitand namaze , yên guhdanê bi paşaroja zimanê kurdî dikin , û her wiha guhdanê bi keltûr , dîrok û çanda kurdî ya ku dijmin ew riswa kiribû .Û di dawî de konkir bangek bilin ji hemî nivîskar û rewşenbîrên kurd re şand û ji wan xwest ku bi rola xwe ya dîrokî di yekîtiya milet de bi riya peyva berpirsiyar dûrî dan û standinên çewt rabin , û herwiha konkir xwest ev yekîtî vekirî be ji bo endametiyê ji hemî nivîskarên ku ne amade bûn , ji ber sedemên awerte , dîsa biryar hat sitandin ji bo avakirina pêwendiyên biratî û wekheviyê bi hemî saziyên nivîskaran re , bi taybetî saziyên kurdistanî. Û di dawiya konkir de desteyek giştî hat hilbijartin ji 15-de endaman .

Pariyê Gendeliyê

Hozan Dêrşewî

Serpêhatiyeke me kurd heye dibêje ”ez mîr û tu mîr wê kî bibe wezîr ” û “ diz û xwediyê malê bûne yek ga di kulekê re dizîn”. Bê guman xwedayê perwerdîgar di Qura`ana pîroz de dibêje semyan û dûndatî xweşiya jiyanê ne , lê dawiyê rastî serdikeve “rasto diristo xwehr0şdlikesto”, civaka me ya kurdî ber bi avakirina welatekî ve diçe , ji ber vê yekê çi karê ku em bikin û bi çi şêweyê encama wê li me û pêşeroja welatê me vedigere, her wiha serkeftina cihgirtî ew e ku mirov bawer be bi hişmendî û karîbûna kesan , ku bi tena xwe û bigendeliya xwe û gotinên xwe , mirov dê nekarîbe tiştekî bike ji bilî xweliyê li serê xwe bike, û pêşketina miletê xwe dûrtir bike, bi karê rast û ciyawaz û xizmet tenê mirov dikare xwe biçîne di dilê kesan de û heger ji xwe hesdike jî bi vî awayî dikare navê xwe bi başî belav bike , mejiyê vekirî ne ew e yê ku “ çav li derî ye xwelî li serî ye” , şaristaniyên herî mezin di dîrokê de bi gendeliyê hatihe hilweşandin , heger hûn herfandina xwe û civaka xwe dixwazin de kerembikin tembûra xwe lêxin sitrana “ kîne em : gendelvanin” bêjin .

www.arsivakurd.org

Zoya li hewlêrê kernevala hunerî dixemilîne

binkeyê giŞtî yê rewŞenbîrî yê kurdî yê ko bi ser wezareta rewŞenbîrî iraqî ve kernevaleke hunerî rewŞenbîrî li darxist li hewlêrê paytexta kurdistanê ,ew kerneval ko sê rojan berdewam kir û xayand ,zoya dengbêja binav û deng ji serê kaniyê rojavayê kurdistanê sitêrka ewê kernevalêbû dema ko bi çend sitranên kurdî ew kerneval xemiland bi dengê xwey nazik û qeŞeng digel du sitranên erebî ko hiŞt cemawerê amadebûyî çepillêdanê jêre bikutîne bo aferînî û dilxoŞiyê

Koçberê qamŞlokî

wê kengî... qamışlo...

xemla xwe vegerîne...
bıratî...hevaltî...şahî...aştî...
kengî wê bên...
kıevokên sıpî..lı asîmanên wê...
kengî wê bı xemılînın....
malên ku vala bûn.....
mıletên ku penaberbûn..
kanıyên ku zıwa bûn...
kenê ku lı ser lêvan çılmısî...
lı benda evîndarên xwe....
kengî evîna qamışlo ...
wê evîndaran hembêz bıke....
kengî .....
kengî emê bıbın yek...
kengî....
rondıkênji dayîkan wê rawestın...
pırsa lı hevıya....
bersıvê ye

"XWENDEKAR SERÊ RIMÊNE DI HEMÛ ŞOREŞ Û RAPERÎNAN DE"

DIJWAR TEWFÎQ-AMÛDÊ

Di navbera Kar û çalakî yên yekîtiya xwendevan û ciwanên demoqratî kurdistanî-roj avaLi bajarê AMÛDÊ roja ÎNÊ rêkeftî 2013\9\27 semînarek hat li darxistin ji aliyê leqê amûdê û rojavayê qamişlo ,û bi amadebûna hejmarek ji xwendevanên zanîngeha Û Despêkir bi rawestan li ser giyanê pakrewanên Kurdisyanê û li ser giyanê Barzanyê nemir,û tê de endamê desteya sikirtariya DIJWAR TEWFÎQ axivî li ser damezrandina yekîtiya xwendevan û ciwana div ê rewşa awarte û taybet ku rojavayê kurdistanê tê de derbas dibe ,û her weha rola wan di hemû guhertinên ku li cîhanê çê dibe,û berpirsê leqê Mezlûm Qerno dest bi şirovekirina pênasîn û armancên yekîtiyê ,û tekez kir ku ev yekîtî rêxistineke kurdistanî ye ,û her weha Canda beşar û Şivan hecî gotin :emê xizmeta xwendevan û ciwana bikin yên ku li ser xaka kurdistanê dijîn, û hêja ye gotinê ku xwendevanên amadebûne kêf xweşya xwe anîn ziman û gotin emê kar û xebata xwe bikin di bin peyrew û pirogramê yekîtiyê ,Û di heman demê de wek BARZANIYÊ nemir dibêje:

www.dersimakurdi.org